# BAVÎTÎ

Qanûna bavîtiyê têkildarî bavîtiya biyolojîk ya zarokan e.

Beriya ku dadgeh bikare derbarê zarokekî de biryarekê bide,pêwist e nasnameya dayik û bavê boyolojîk diyar be. Dêûbav yan jî dezgeheke hikûmî yê piştgiriyê dide zarokî, dikare dozeke bavîtiyê veke ku bavê zarokî bê naskirin. Piştî ku bavîtî bê îsbatkirin, dadgeh dikare derbasî fermanên têkildarî welayetê, serdanê, nefeqeya zarokan û dayîna lêçûnên sîgorteya tenduristiyê bibe. Heke pêwîst be, dadgeh dikare sertîfîkaya jidayikbûnê ya zarokî biguherîne.

Qanûnên Dakotaya Bakur diyar dikin ka têkiliya bav-zarok divê di navbera zilamek û zarokekî de çawa be.

*Riyên Tesbîtkirina Bavîtiyê li Dakotaya Bakur*

- Testa genetîk ango bi navê tê zanîn testa DNA'yê. Ev test ji bo hindê tê bikaranîn ku bê diyarkirin ka ji aliyê qanûnî ve bav kî ye, lê heke bav yan jî dêbavî hatibe diyarkirin, test nayê kirin. Dadgeh dikare bixwaze ku heqê testê bav bide yan jî bê parvekirin yan jî fermanê bide ku desteya karûbarên civakî ya herêmê bide.
- Bavîtiya texmînî ev e ku zarok yan di dema zewacê de yan jî 300 rojan piştî bidawîbûna zewacê (hevberdan, mirin, betalbûna zewacê) yan ji jihevcudabûna dayik û bavî çêbûbe, wê çaxê tê texmînkirin ku bav ew zilam e. Bavîtiya texmînî dikare di vê rewşê de jî bê kirin, heke zilam bi awayekî vekirî îdia bike ku bav ew e.
- Biryara dadgehê ev e ku têkiliya bav-zarok bi biryara dadgehekê bê diyarkirin. Kiryareke qanûnî ya bi teblîxat û gilîkirinê vê pêvajoyê didin destpêkirin.
- Bixwedîkirin ango adopsiyon pêvajoyeke dadgehê ye ku têkiliya dêûbav û zarokî diafirîne. Kesek ji dadgehê dixwaze ku zarok bixwedî bike. Piştî ku zarok hat bixwedîkirin, têkiliyên xwînî dê li ber çavan bên girtin.
- Naskirina Bavîtiya Bidilxwazî piştî îmzekirina formekê, têkiliya bav-zarok bi awayê qanûnî ava dike. Ev bi piranî di wê rewşê de pêk tê, heke zarok ji dayik û bavê nezewicî hatibe dinê û dayik îtirazî naskirina bavî nake. Piştî ku form bê dagirtin û îmzekirin navê bavî dê li ser sertîfîkaya jidayikbûnê ya zarokî bê danîn.

[North Dakota Century Code Chapter 14-20]

[North Dakota Human Services - Paternity]